

Nameyên Sersaxiyê

Bi şîn û êşeke mezin me nûça koça dawî ya xebatkar Ismaîl Umer serokê partiya yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (yekîtî) bihîst, di dema ku em sersaxiya germ pêşkêşî hevalên partiya yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê dikin, me di rêxistina Elmaniya de ya Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurd li Sûriyê, biryar daye ku em wê ahenga ji bo vejandina bîranîna bîst û şeş saliya koça dawî ya helbestvanê mezin seydayê Cegerxwîn -ya ku wê li bajarê Vechta li Elmanya di 23.10.2010 an de bihate sazkirin- têkda bibin. Herweha em jî bi hevalên Partiya Yekîtî ya Demokrat re vê şîne di koça dawî ya mamoste Ismaîl Umer de - yê ku pirê jiyana xwe di ber bidesxistina pîrsa mîletê xwe de borandiye, pevte dikşînin.

Em sersaxiya hevalên Partiya yekîtî ya Demokrata Kurd li Sûriyê û ya hemû zarûzêçên gelê Kurd bi vê koça dawî ya kurekî wanî xebatkar, dikin.

Rêxistina Elmaniya ya Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

BEHÎNAME

Bi navê Xwedayê pak ê dilovan .
Em ji Xwedê re ne û emê lê vegevin
Biraderên hêja : Di komîta sersaxiya nemir BAVÊ ŞIYAR û yên di partiya Yekîtî (Elwehdê) de , serê we sax be, Xwedê cezayê we xêr binivîse , ji dêla şîna we şahiyê vegevin û Xwedê li mamoste ISMAÎL UMER bibûre .
Dostên hêja : Li min biborin, min nikarî li sersaxiyê amade bibim . Ji sedema rewşa taybet û kiryarên civakî yên bi min re derbasbûbûn. Ez xemgînim û bi meraq bûm di wê behiyê de beşdar bibim, ji ber nixê BAVÊ ŞIYAR gelek li cem min heye, nexasim min ew ji nêzîk ve naskiribû û nayê ji bîrkirin wek kes yan endamek civakî yan xwedî ramanek ronak û bizavek siyasî û bi rûmet.

Koçbûna BAVÊ ŞIYAR hestê netewî bi mîlet re geş kirin û bû livandinek di derya karên siyasî ji Kurdên Sûriyê re û wê bibe egerekî herî xurt ji partiya Yekîtî re, ku encamên serkeftî bi dest bixe Hûn bimînin di xweşiyê de

BIRADOSTÊ MÎTANÎ 23 . 10 . 2010

Nameyên Sersaxiyê

Rêxistina Elmaniya ya Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Sersaxî

Endamên nivîsgeha navendî...

Heval û endamên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî),

Malbata Xwedê jê xweş Isma'îl Umer yên birêz.

Îroj bi nûçeya koça dawî ya mamoste û xebatkarê Xwedê jê xweş Isma'îl Umer re em pîr xemgîn bûn, û bi vê koça wî, ziyaneke pîr mezin ghişte Tevgera Kurd û niştîmanî û Danezana şam di hindurê Sûriyê de. Ji ber ku Xwedê jê xweş, roleke wî balkêş di nav pêşvebirina çalakî û pêdanasîna pîrsa mîletê Kurd de di hindurê Sûriyê de hebû. Herweha keda wî bo bidesxistina mafên hemû gelê Sûriyê di rêka avakirina sistemeke demokrat û pêşketî de hebû.

Bi vê koçê, hemû endamên rêxistina partiya me li Elmaniya, biraderek û dostekî xwe yî xebatkar , hevkar û dilawer wînda kir. Em bawer in ku cihê wî vala namîne, û hevalên wî dikarin wan doz , hêvî û daxwazên wî bighînin serî.

Em sersaxiyê ji heval , hogir û malbata Xwedê jê xweş re û aramî ji we re dixwazin. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şa bike.

18.10.2010

.....
Bi dilekî xemgîn me nûçeya koçkirina mamoste Ismayîl Umer (Serokê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê) wergirt di demekê de ku gelê Kurd li Sûriyê di zehmetrîn qonaxên jiyana xwe de derbas dibe. Mixabin tişt ji destê mirov dernakeve ji bilî ku lavayan bike, ku giyanê wî di cihêkî aram de razana xwe ya sermedî bibîne.

Em sersaxiya malbat, dost , heval û hemû mîletê Kurd û hêviya hedanê di vê helkefta xemgîn de ji bo wan dikin.

Mistefa Mihemed "Bavê Kurd" – Endamê berê yê Parlemana Sûriyê

Luqman Ehmed – Hunermendê şêwekar

Mistefa Ibrahim – Çalakvan

Cîhad Salih – Rojnameva

Sîrwan Qîço – Rojnamevan

Majda Darî – Helbestvan